Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1117 | 15-Mijdar- 2023 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
nameronahi@gmail.com
☎ 423165

## Seyîd Riza û hevrêyên xwe 86 sal berê wek îro hatin darvekirin



**Rêberê Kurd ê serhildana Dêrsimê Seyîd Riza û 6 hevrêyên xwe 15'ê Mijdarê sala 1937an ji aliyê rejîma kemalîst a Mustafa Kemal a Tirkiyê ve hatin darvekirin.**

Dema Seyîd Riza dibin sêdarê dibêje: "Min nekarî ji heq derew, fen û fûtên we derkevim. Bila ev ji min re derd be, lê min jî xwe li ber we neçemand, bila ev jî ji we re derd bimîne."

Seyîd Riza herwiha gotiye: "Ewladê Kerbela me. Guneh e! Ev zilm e. Ev cinayet e."

Seyîd Riza sala 1862an, li Dêrsimê ji dayik bû ye. Seyîd Riza lawê Seyda Îbrahîm e. Ji zanyarekî bi navê Mehemet Elî Efendî ders dît û mezin bû. Mehmet Elî, ji aliyekî ve agahiyên olî, ji aliyê din ve jî di warê neteweyîtiyê de perwerdehiyê dida Seyîd Riza. Piştî mirina bavê xwe, wî Seyîdî dewir girt û di bajarê Axdadê de bi cîh bû.

Di rojên serhildana Qoçgiriyê de komeke çekdar, çûn Dêrsîmê û birqiyeke ku piştgiriyê dide serhildêran, kişandin. Seyîd Riza, piştî serhildana Şêx Seîd alîkarî da koçberan. Berî serhildana Dêrsimê Seyîd Riza, li hemberî gumana operasyonê bi serkerdeyên eşîran rê hevdîtinê çê dike ku di nava xwe de yekîtiyê çêkin. Di demeke ku li Dêrsîmê serhildanê berdewam dikir, di 5'ê Rezbera 1937an de, rayedarên hikûmetê ji bo hevdîtinan li Erzînganê bangî Seyîd Riza dikin. Seyîd Riza, di rêya Ezirganê de tê girtin û wî dibin Elezîzê û bi berdariye tê darazxwarî kirin.

Serokê serhildana Dersîmê Seyîd Riza, di 15'ê Mijdara sala 1937an de, tevî şeş hevalên xwe ve, ji aliyê rejîma Tirkiyê ve hatin darvekirin.


Çar têkoşerên din jî berê bi sizayê berdariyê siza dikin, paşê sizayê wan werdigerînin girtîbûnê. Hin ji wan jî li ser 90 salî re bûn, Tirkan nexwestin navê xwe xerab bikin. Lê herçendî gorî zagonan diviyabû Seyîd Riza jî darve nekirane, lê salên wî bi qanûnî mezin dikin û berdariya dikin.

### Siyasetmedar û têkoşerên ku hatin darvekirin

**Seyîd Riza**

Resik Huseyînê lawê Seyîd Riza.
Seyd Husên, Seyd Wuşên, Seyd Husênê Şêxî
Findiq Axayê Ûsivî, Findiqê lawê Qemer. Hesen Axayê Demenî, Hesenê Cibo, Hesenê lawê Cebraîl. Hesenê Qurêşî, Hesenê lawê Ûlkiye. Elî Axayê Mîrza, Eliyê lawê Mîrza Elî
Kesên ji berdariye filitî. Cebraîl Axayê Demenî, Civê Kejî, Ciboyê Demenî
Qemer Axayê Ûsivî. Qemer Axayê Heyderî, Qemoyê Heyderî (96 salî ye 31 sal ceza didinê, di zîndanê de jiyana xwe jidest dide)

## Hawnaz bi hunera xwe, enerjiyek erênî belavî gerdûnê dike



Hunermenda Helebceyî Hawnaz Haşim bi hêza xwe ya wênesaziyê, dîwarên sade û spî yên zanîngeha Helebceyê bi gelek proje û berhemên hunerî yên balkêş xemilandiye û enerjiyek erênî belavî gerdûnê dike.

Hawnaz Haşim a 30 salî wênesazek a Helebceyê ye. Hawnaz di sala 2016'an de xwendina xwe ya hunerî qedandiye û niha wek karmendek li Zanîngeha Helebceyê kar dike. Li gel wê jî jêhatina we ya di warê şêwekariya hunerî û wênesaziyê de pêşdixe.

Hawnaz Haşim li zanîngeha Helebceyê bi dest û tiliyên xwe gelek karên hunerî yên bêhempa çêkiriye. Hawnaza bi xwe qala destpêka vê xebatê xwe dike û diyar dike ku dema hatî zanîngehê dîwar hemû spî bûn û xwest ku li ser dîwar çend tabloyan çêbike. Piştî ku ji malê tabloyên xwe tîne li odeya xwe bi cih dike, wek bi xwe dibêje hewl dide ku tiştek ji bo zanîngehê bike ku şêweyek ciwan bide dîwarên wê û şûna destê wê di hunerê de diyar be.

Hawnaz wiha qala şêwazê hunera xwe dike: "Karê min yê yekem ew bû ku min hinek pirtûkên kevin ku êdî nedihat xwendin, li şûna ku bavêjim li ser parçe texteyek dubare bikaranî û projeya xwe ya hunerî li ser çêkir."

Herwiha Hawnaz qala projeyek din a xwe ya hunerî kir ku bikaranîna 200 pirtûkan berhemek din ê hunerî çêbike û di derbarê wê de jî wiha tîne ziman: "Bi vê xebatê bi ti awayî ziyanek negihiştiye jîngehê. Ev pirtûkên ku êdî nikarin werin xwendin bi şêweyek lê dikim ku ji bo hertiştê sudmend dibe."

Hunermenda Kurd bi rêya projeyên xwe hewl dide ku heskirina ji welat re bi xwendevanan bide avakirin û bi berdewam çavê wan li ala Kurdistanê be. Li ser xebatê xwe yê ku niha dewam dike jî destnîşan kir ku heftiyeke kar li ser dike ku serokê zanîngehê jî kedek li gel kiriye.

Herî dawî Hawnaz Haşim tekezî li ser armanca xwe kir û wiha pê de çû: "Armanca min bi van proje û berhemên hunerî ew e ku li ser dîwarên spî û sade yên ku ez lê dixebitim, karekî hunerî hebe da ku bala xwendevan û yên ku tên zanîngehê bikişînim."

### Sudoku: Bersiv 28

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 8 | 1 | 3 | 4 | 5 | 2 | 9 | 7 | 6 |
| 2 | 5 | 7 | 1 | 6 | 9 | 8 | 3 | 4 |
| 4 | 6 | 9 | 3 | 8 | 7 | 2 | 5 | 1 |
| 6 | 7 | 4 | 5 | 9 | 3 | 1 | 2 | 8 |
| 3 | 9 | 1 | 6 | 2 | 8 | 7 | 4 | 5 |
| 5 | 2 | 8 | 7 | 4 | 1 | 3 | 6 | 9 |
| 1 | 3 | 6 | 9 | 7 | 5 | 4 | 8 | 2 |
| 9 | 8 | 5 | 2 | 3 | 4 | 6 | 1 | 7 |
| 7 | 4 | 2 | 8 | 1 | 6 | 5 | 9 | 3 |

### Sudoku:Pirs 29

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 6 | | | 8 | | | | | |
| 5 | | | | | 9 | 1 | | 2 |
| 7 | 1 | | | | 4 | | | |
| | 8 | | 3 | | 7 | | | |
| 2 | | 5 | 1 | | 6 | 7 | | 8 |
| | | | 9 | | 5 | | 1 | |
| | | | 2 | | | | 5 | 1 |
| 3 | | 9 | 7 | | | | | 4 |
| | | | | | 8 | | | 9 |

## FERHENGA BIWÊJAN

**Ew roj be li ti kesî dernakeve:**
- Çavteng e; xêra ti kesî naxwaze.
**Ew pezê li bihara wî biçêre şîr nade:**
- Çavteng e; naxwaze qencî bi ti kesî bê kirin.
**Gayê zexel e:**
- Pir kîndar e.
**Jehra wî di zikê wî de ye:**
- Mirovekî zikreş e.
**Ku bibe roj tavê nade mirovan:**
- Mirovekî pir zikreş e.
**Kumreş e:**
- Zikreşiyan dike; çavê wî bare nagire.
**Kumreşiyan dike:**
-Bi heman wateyê.
**Li ber çavan xuya dike:**
- Bi heman wateyê.
**Li ser tiliya kul mîz nake:**
- Çavteng e; zikreş e; dilnexwaz e.
Ma nanê genimî li sêwiyan heram e?
-Ji ber ku rewşa wî ya aborî baş bûye çima li we nexweş tê?
**Marê zikê wî mezin e:**
- Pir zikreş e; ji ti kesî hes nake; ji ti kesî re naxwaze; xêrnexwaz e.
**Naxwaze roj li ti kesî derkeve:**
- Bi heman wateyê.
Ne xwar û ne da hevalan, genî kir avêt newalan.
**- Zikreş e:**
Naxwaze dû di kuleka wî re derkeve.
- Li hemberî wî kîndar e; naxwaze rewşa wî baş be, dixwaze her tim xizan be.
**Tu bi marê zikê wî nizanî:**
- Pir zikreş e; ji ti kesî hes nake; ji ti kesî re naxwaze; xêrnexwaz e.
**Zikê xwe jê diêşîne:**
-Dilê wî jê re naxwaze; derbarê wî de zikreşiyê dike.
**Zikê wî reş e/zikreş e:**
- Ji hevalê xwe re naxwaze; xêrnexwaz e.
**Zikreşiyan dike:**
- Çavên wî bare nagirin; naxweze; xêrnexwaz e.
**Zikmarî ye:**
- Ne durist e; xayîn e; zikreş e.

**LI SER GELACIYÊ**

**Agirê wî li heriyê jî diçe:**
- Gelac e; fesad e; gotinan digerîne.
**Biagir dilîze:**
- Gelaciyê dike.
**Çov nava çalê re kir:**
- Gelacî kir; bû sedema nexweşiyê; bû sedema fitneyê.
**Çov kir navê:**
- Bi heman wateyê.
**Darikê gebolê ye:**
- Gelac e; fesad e; tevlîheviyê dike; navbera mirovan xirab dike.
**Darikê hewdelê ye:**
- Bi heman wateyê.
**Devê xwe bi xêrê venake:**
- Bi heman wateyê.
**Devê xwe ji bo xêrê venake:**
-Bi heman wateyê.
**Ew agir pê dixe û ew dike hawar:**
- Gelac e; şerxwaz e; hem gelaciyê dike, hem xwe baş nîşan dide.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî



## 22 Rojên Binçavkirina Silêman Ehmed 33 salên îxaneta PDK'ê vedibêje

Rojname û rojnamegerî di hemû beşên jiyanê de xwedî roleke girîng in, erkê her rojnamevanekî ew e ku Maske û perdêyan ser heqîqetê daxîne, sirên ku divê mirov bizane bigihêje wan, da ku helwest di cihê xwe de xuya bibe.Heya xelk karî bin Rastî û ne Rastî ji hev cudabikin û nasbiken.**R-4**

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1117 | 15-Mijdar- 2023 | www.ronahi.net/ku/



## Jin pêşenga dîrok û siberojê ye

Bi Şoreşa 19`ê Tîrmehê re jinê di asta pêşengtiyê de di gelek kar û xebatan de cihê xwe girt û xebatên perwerdeyê jî yek ji van xebatên serekebû ku jin cihê xwe têde digre. Herwiha di damezrandina zanîngiha Rojava de jî jin xwedî kedeke mizin bû û di asta rêveberiyê û perwerdeyê de jî xwedî kedeke mezin e. Jinê bi vîn û xebata xwe dîwarên malê derbaskirin û di karên perwerdê, rêveberiyê û avakirina civakê de xwedî roleke mezin bû.**R-2**

# KAMPANIYA AZADIYA RÊBER APO LI CÎHANÊ DENG VEDA

**Kampaniya cîhanî ya bi dirûşmeya 'Ji Rêber Abdullah Ocalan re Azadî, ji Pirsgirêka Kurd re Çareseriya Siyasî' ku di 10'ê Cotmehê de hatibû destpêkirin, li tevahiya cîhanê belav bû. Li Bakur û Rojhilatê Sûriyê jî tavahiya tevger û gelên herêmê ji bo piştgiriya kampaniyê çalakiyên xwe dewam dikin. Endamên Insiyatîfa Sûriyê ya Azadiya Rêber Abdullah Ocalan dan zanîn ku ew ê bi kar û xebatên xwe û bi bilindkirina asta têkoşînê kampaniyê bighînin armanaca wê û azadiya Fîzîkî ya Rêber Apo misoger bikin.R-5**



## Dadgeh parêzvanê mafê civakê ye



Hevserokê Meclisa Dadmendiyê li Herêma Cizîrê Hisên Fatimê diyarkir ku peywendina wan bi civakê re xurt e, û got ku ew bi hemû awayî hewildidin ku bi riya komîteyên lihevhatinên civakê pirsgirêkan çareserbikin û têkiliyên xwe bi civakê re xurtir bikin.**R-6**



## 'Bi şoreşê wê têkoşîna jinan bi ser bikeve'

Ji bo tundiya li jinê were dîtin, mîna 8'ê Adarê Roja Jinên Kedkar ên Cîhanê ev roj jî vediguhere kevneşopiyeke girîng a têkoşîna jinê. Dema ku mirov li destketiyên vê yekê dinihêrin, dibînin ku her sal têkoşîna jinê hîn bêhtir bi pêş ve dibe û wê bi pêş ve bibe.**R-3**

Li Îranê jin rastî qirkirine tê — Nehîr Pale — R-2
Nakokiya dijwar a lûtkeya Riyadê — Zekî Bedran — R-5
Nameyên Seyîd Riza — Farûk Sakik — R-5
Der barê (Rêzimana Kurmancî) de çend têbînî — Kemal Necim — R-7

# Jin pêşenga dîrok û siberojê ye

Bi Şoreşa 19`ê Tîrmehê re jinê di asta pêşengtiyê de di gelek kar û xebatan de cihê xwe girt û xebatên perwerdeyê jî yek ji van xebatên sereke bû ku jin cihê xwe têde digre. Herwiha di damezrandina zanîngiha Rojava de jî jin xwedî kedeke mizin bû û di asta rêveberiyê û perwerdeyê de jî xwedî kedeke mezin e. Jinê bi vîn û xebata xwe dîwarên malê derbaskirin û di karên perwerdê, rêveberiyê û avakirina civakê de xwedî roleke mezin bû.

**Ayşa Silêman / Qamişlo**

Kar û xebatên jinê di zanîngehê de ne tenê di milê wanedayînê de ye. Lê jinê cihê xwe di rêverberî, ragihandin, kar û barên rêveberiya xwendekaran de jî digre.

Şêwirmenda beşê jinolojî li zanîngeha Rojava Evîn Ehmed di derbarê jin û perwerdeyê de ji Rojnameya me re axivî.

Kar û xebatên jinê di milê perwerdeyê de

Evîn Ehmed diyarkir ku jin di zanîngehê de karê wê netenê wek semînervan e, lê wek şêwirmendên xwendekaran jî kar dikin. Herwiha bi xwendekaran re gotûbêj dikin û dibin alîkar da ku pirsgirêkên wan çareserbikin û wiha got: "Ev tê wateya ku perwerde ji bo jinê girîng e, heya ku cihê xwe di van qadan de digre û van qadan de pêşengiyê bike. Dema em vegerin dîrokê em ê, bibînin ku di destpêka jiyana mirovahiyê de jin û mêr bi rengekî wekhev kar dikirin û tu ferq û cudatî di navbera wan de tunebû û wekhevî hebû. Di dema civaka xwezayî de jin bi keda xwe cihekî xwe yê taybet û girting di nava civakê de avakir û jiyan li dora jinê, ked û bandora wê kom dibû. Lê dema ku di civakê de çavnebarî, hesûdtî û cîn derketin holê, desthilatî kete destê zilamê serdest de. Zilam bi hişmendiya xwe ya ku tenê xwe esas digre, di serî de serdestiya xwe li ser jinê da meşandin û piştî wê jî bi riya serdestiya li ser jinê û kolekirina wê, civak jî hate kolekirin.

Astengiyên ku jin têre derbas dibe

Evîn Ehmed da xuyakirin ku astengiyên îro jin dikşîne sedemên wê jî dîrokî ye. Lê pirsgirêka ku jin rastî wê tê him ji aliyê malbatê û him jî ji aliyê civakê ve ye. Zewaca zû û zexta malbatê li ser keçên ciwan dibe astengî li pêşiya wê û herwiha gava keç dizewice zexta mêr li ser zêde dibe. Derfetên perwerdeyê li pêşiya wê tê girtin û hin jin hene xwedî bawernamene jî, lê mixabin civaka me herdem di hişmendiya wan de ew e, ku jin ji bo pereyan dixwîne. Loma mêr jêre dibêje zarokên xwe xwedî bike û ez ê pereyan bidim te. Lê hin jin hene piştî ku dizewicin jî kar dikin, lê dema jin mala xwe birêve dibe, zarokan xwedî dike û kar jî dike, ev yek bandorê li derûniya wê dike. Gelek jin hene di perwerdeya xwe de bê moralin, ji ber ku rastî van astengiyan tên û hewcedarî hêzek xurte heya ku li ber xwe bidin. Lê mixabin mêr jî gelek caran pêre nabe alîkar, ji ber ku hîn hişmendiya hin mêran nehatiye guhertin û dibêjin nabe ku em alîkariya jinê di karê malê de bikin. Çareseriya van pirsgirêkan ku jin li berxwe bide û xwe neke koleya van kevneşopiyan û di navber xwe û mêr de hefsengiyekî çêbike. Herwiha xwe perwerde bike û pêşbixîne û xwedî îradeyeke xurt ber. Ji ber ku Rêber Apo jî herdem di nav gotinên xwe de dibêje; dema mirov îradeya xwe xurt bike dikare guhertina herî mezin pêkbîne û ew îrade jî li cem jinê heye gava ku jin xurt bike kes nikare wê kole bike. Loma çareserî ji bo van pirsgirêkan hemûya, destpêkê divê jin xwe perwerde bike, dîroka xwe baş nasbike û xwedî îradeyeke xurt be."

`Şêr şêr e çi jin e çi mir e'

Şêwirmenda beşê jinolojî li zanîngeha Rojava Evîn Ehmed di dawiya axaftinên xwe de wiha got: "Guhertinên ku jinê çêkirine yek ji wan bi keda xwe jinolojî wek zanistek di nav civakê de hate pejirandin. Herwiha Kongira Star zagonên jinê derxistin holê, ev zagon bi fikir, felsefe, perwerde û lêkolînên jinan heya ku ev zagon derketin, derxistina zagonan ji bo jin diyar dike ku çiqasî jin di asta perwerdeyê de pêşketiye û di heman demê de di qadên siyasî, civakî û leşkerî de jî cihê xwe girtî ye. Guhertina herî mezin a ku jinê çêkirî avakirina hêza YPJ'ê ye, mînaka ber biçav Nisrîn Ebdula



ye, ya ku bi cilên leşkerî derbasî qesra Parîs bû û bi cilên xwe xwe nîşan da. Tevî ku qedexebû ku tukes bi cilên leşkerî derbas bibin, lê ew bi vîn û îradeya xwe ya xurt derbas bû, herwiha mînaka herî mezin Hefrîn Xelef bû, ya ku di nav vê civaka ku qedexeye jin bixwîne wê siyaset dikir û dema şehîd ket jî şehadeta wê bû sembol û hêz ji bo xurtkirina jinan da ku tevlî qada siyasî bibin. Hêviya min ew e, heta ku civak were guhertin, destpêkê perwerde pêwîste. Ji ber ku perwerde guhertina herî mezin e, ya duyem jî ku em rêveberiyeke demukrat avabikin, ya siyem jî em tu carî cûdahiyê nexin navbera zayendan de û wek helbestvanê kurd cegerxwîn jî dibêje; Şêr Şêre Çi Jin e Çi mir e, di vir de ji me re dide xuyanî kirin ku cudahî di navbera wan de nîne. Heya ku civakeke demokrasî avabibe divê ferq û cûdahî di navbera herdû zayendan de nebe û jiyaneke hevbeş di navbera wan de were avakirin."

# Berxwedana jinê ya li hemberî tundiyê wê berdewam be

**Ronaz Silêman/Qamişlo**

**Endama Meclisa Jin ya PYD'ê Nisrîn Tahir diyar kir ku pêngava 'Na ji kuştina Jinan re, Jin Jiyan Azadî' di hemleya xwe ya çaremîn de bi çalakiyên cuda berdewam e û got, armanca me ya serke ji pêngavê bilindkirina asta têkoşîna jinê ya li hemberî tundiya ku li ser tê meşandin.**

Li herêmên bakur û rojhilarê Sûriyê, li dijî tundî û kuştina jinê, Meclisa Jin a Partiya Yekîtiya Demokratîk (PYD) bi dirûşma 'Na ji kuştina jinan re, Jin Jiyan Azadî', di sala 2020`an de pêngavek dabû destpêkirin, herwiha pêngav bê navber dewam dike, di sala 2023`an de, bi daxuyaniyekê domandina hemleyê hatibû ragehandin.

Derbarê Pêngava 'Na ji kuştina Jinan re, Jin Jiyan Azadî', endama Meclisa Jinê ya Partiya Yekîtiya Demokratîk (PYD) Nisrîn Tahir ji rojnama me re axivî.

Nisrîn Tahir diyar kir ku wan merheleya çaremîn ya pêngava 'Na ji kuştina jinan re, Jin JiyanAzadî' daye destpêkirin û wiha got: "Li hemberî tundî, destrêjî û qetlkirinê ku jin rastî wê tê ji aliyê malbat û mêran ve, herwiha ji bo piştgiriya jinên herêmê, Meclisa jin a PYD'ê , di sala 2020`an de dibin dirûşmeya'Na ji kuştina jinan re, Jin Jiyan Azadî' pêngavek da destpêkirin. Ji ber êrişên çeteyên DAIŞ`ê û yên dewleta Tirk a dagirker û çeteyên wêyên li ser herêmê, herwiha ji ber hişmendiya civakê ya bavkisalariyê, asta tundiya li dijî jinan bilindtir bibû, li himberî wê me xwest bi vê pênagvê em ji jinan re bibin piştgirî da ku jin mafê xwe bi dest bixe."

**'Armanca pêngavê bilindkirina asta têkoşîna jinan ya li hemberî tundiyê ye'**

Nisrîn Tahir di berdewamiya axaftina xwe de diyar kir ku armanca wan ji pêngavê ew e ku tundî û kuştina li ser jinan bi dawî bibe û wiha got: "Armanca ji pêngavê



ew e ku dengê her jinekê derxînin û li hemberî tundiyê bisekinin. Ji xwe pêngava me ne tenê ji bo jinên kurd de, ji bo jinên tevahî pêkhateyan e, herwiha me gelek peywendî jî bi Êlên Ereba re jî li herêmên wek; Til Hemîs, Şedadê, Hol û li gelek herêmên din jî kirin. Waneyên hişyariyê jî di derbarê kuştin û tundiya jinê, bi jinan re didin şîrovekirin û mafên wan yên jiyanî bi wan didin naskirin, ev hişyariyan ku hatin dayin, encameke baş jî girtin. Jin mafê xwe nas dike, lê pêwîstiya wê bi destkê heye."

**'Pêngava 'Na ji kuştina Jinan re' bê navber berdewam e'**

Endama Meclisa Jinê ya Partiya Yekîtiya Demokratîk (PYD) Nisrîn Tahir axaftina xwe wiha qedand: "Heta ku jin rastî tundî û kuştinê bê, wê pêngav berdewam be û wê dawîbûn jê re tune be. Di Rêveberiya Xwesre de jin cihê xwe di hemû qadan de girtiye û di her karî de çalak e, mînaka wê jî, dema ku em serdana her saziyekê dikin em rêjeya jinê ji ya mêr zêdetir dibînin. Jin bingeha civakê ye, bi azadiya jinê re civak jî azad dibe, lê hîn jî tundî li ser wê berdewam dike. Di sala bûrî de jî bernameyê me di derbarê, naskirina zagonên jinê hebû, li ser wê biroşûr li jin, mêr û tevahî civakê hatin belavkirin. Niha jin mafê xwe nas kiriye, ji bo wê em waneyên naskirina mafê jinê pêşkêşî mêran dikin. Herwiha çalakiyên ku di pingav 4`an de tên dayin jî ev in; li dar xistina semînerên diyalogê li kantonan û serdana jinên ku tundî li dijî wan pêk hatiye, bi taybet em dixwazin serdana kampa bikin. Ji xwe tensîqa Meclisa jinê bi gelek deveran re heye, di riya wan de em xwe dighînin tevahiya jinan."

## Ji Pênûsa Jin

### Li Îranê jin rastî qirkirine tê

Nehîr Pale

Li Rojhilatê Kurdistanê û Îranê jin li hemberî sîstema heyî bi silogana Jin, Jiyan, Azadî dest bi şoreşê kir. Jîna Emînî yek ji nûnerên vê şoreşê bû, bi wêrekî serî li hemberî sîstema dagirker ku jinê diperçiqînê rakir û li gel hemû jinan daxwaza azadî û mafê jinan kir. Dewletê bi destê polîsên exlaqî roja 15`ê Îlona 2022`an bêrehmet li kolanê bi hiceta pora wê di bin hîcabê de derketiye ew işkence kirin û kuştin. Bertekên gel û bi taybet ê jinan li hemberî kuştina Jîna Emînî gelekî xurt bû. Ev bertek cîhanî bûn û li hemû bajarên Rojhilatê Kurdistanê û Îranê gel daket kolanan. Jin di serhildanên xwe de diyar kirin ku hîcab ne namûsa wane û saziya bi navê polîsên exlaqî napejirîn in. Dewleta Îranê mîna ku her roj derbe li ser gel bike ket nava tevgerê de. Jin û ciwan hedef girtin, hejmareke mezin heyanî niha di zîndanê de ne, bi hezaran kes birîndar bûne û destûr nadin wan ku birînên xwe derman bikin û yên mayî jî her roj gef li wan têxwarin.

Dewletê bi gelek rêbazan êrîşî jin û ciwanan kir, hemû şagirtên dibistanan û zanîngehan jehrî kirin. Herî dawî 4`ê Mijdarê 2023`an li dibistana keçan a Kewser a bajarê Ahwazê şagirt rastî êrîşa kîmyewî hatin û bû sedema bi dehan xwendekaran rakirin nexweşxanê. Dewleta Îranê bi riya saziyên xwe yên fermî daxuyanî dan raya giştî ku têkiliya wan bi jehrîkirina şagirtan re tine ye.

Piştî ku li Rojhilatê Kurdistanê û bajarê Îranê gel rabû serhildanan û helwestê xwe li hemberî saziya polîsên exlaqî anîn ziman, dewletê careke dîtir ew polîsên exlaqî vegerandin kolanan. Keça Kurd Armîta Gerawnd li kolanê ji aliyê polîsên exlaqî ve hat işkencekirin û roja 28`ê Cotemehê sala 2023`an li nexweşxanê şehîd bû. Hêzên ewlekariyê yên dewletê destûr nedan ku malbata Armîta Gerawnd cenazeyê keça xwe ya 16 salî li gund veşêrin. Ji bo gel ranebe serhildanê her dever dorpêç kirin û bi awayekî veşartî cenazeya Armîta hat veşartin.

Her wiha dewleta Îranê li hemberî jinên siyasetmedar polîtîkeke taybet dide meşandin. Jina siyasetmedar Bexşan Ezîzî 16`ê Mijdarê sala 2009`an bi şagirtên zanîngeha Tehranê re li hemberî polîtîka Îranê ya darvekirinê nerazîbûna xwe anînbûn ziman û meş kiribûn. Ji ber ku Bexşan Ezîzî jî tevlî vê meşê bibû ji aliyê dewleta Îranê ve hatibû girtin. Piştî 4 mehan ew serbest berdabûn. Roja 4`ê Tebaxa 2023`an jî di bin navê ew endama partiyeke siyasî ye careke dîtir hat girtin. Li ser hatiye qedexekirin ku parêzer bigre yan jî malbata wê serdana wê bike û ev bûye 3`ê meh agahî jê nayê girtin.

Nercis Mehmedî jî ku niha di zîndanên Îranê de ye û giran nexweşe qedexe ye ku kesek pirsa wê bike, yan rabikin nexweşxanê û eger kesek serdana wê bike ji aliyê dewletê ve tê girtin. Di heman demê de 9`ê Cotmehê li zanîngeha Azad ya Îranê xwendekareke jin bi hiceta zagonên hîcabê pêk ne aniye ji aliyê hêzên ewlekariyê yên zanîngehê ve rastî êrîşê tê û wê radikin nexweşxanê.

Di encama hemû polîtîkayên ku dewleta Îranê li hemberî jinê dide bi kar anîn diyar dibe ku jin rastî qirkirinê tê û kîjan jin li hemberî sîstema Îranê serî hilde yan xwe bi rêxistin bike wê were tine kirin.



# Kela Alamûtê Xwişka Zap, Metîna û Avaşînê

**Volqan Elî**

Li gorî dîrok dinivîse: Hesen Sabbah ji bo ku li hemberî zilma Selçûqiyan berxwedanê bi rêbixe , diçe li hêlîna teyr û bazan. Kela Alamûtê bi cih dibe. Hedefa wî ew e ku vê dagirkeriya ji Asya Navîn xwe berdeya li ser civaka Arî, ji holê rake. Plana wî çawa ye? Dibêje ez ê li vê Alamûta ku tu kes nikare xwe bigihînê komeke fedayiyan tanzîm bikim. Ev ê bi ruhekî fedayî biçin ser dijmin. Yekane armanca wan tinekirina dijmin e".

Hesen Sabbah li gorî vê dikeve tevgerê. Rêxistina xwe ya fedayiyan çêdike. Dest bi têkoşîna xwe ya li dijî Selçûqiyan dike. Werhasil fedayiyên ku perwerde dike, gelek wezîr û mamurên dagirkeran bi mirinê ceza dikin.

Yek ji hedefên wan ê giregir jî Nîzamulmulk e. Ew, serwezîrê Selçûqiyên xwînmêj e. Herî dawî (dawiya Nîzamulmilk) wî dikin hedefa xwe. Lê kesekî diyar e hevkar û dildarê Nîzamulmulk e wisa behsa kuştina wî dike, "Nîzamulmulk êdî ji Hesen Sabbah bêzar bûbû. Ji ber vê yekê derdora Kela Alamûtê xiste bin hîsarê û dorpêç kir. Du fedayiyên Hesen Sabbah ku hespên xwe berewajî nal dikin û xwe digihînin ew şûna ku Nîzamulmulk lê dimîne. Leşkerên Nîzamulmulk dema van dewsan dibînin, dibêjin qey du kes ber bi Kela Alamûtê ve çûne. Piştî vê her du fedayî xwe digihînin Nîzamulmulk. Dema ji hemamê derdikeve canê xwe ji dest distînin."

Em werin li ser çîroka çalakiya 'Tabûra Nemiran' ku zirava Enqereyê qetandiye. "Du fedayiyên 'Tabûra Nemiran' a HPG'ê ev çalakî li darxistiye û têkiliya wan bi Bakûr û Rojhilata Sûrî re tîne." HPG vê dibêje. Jixwe ji bo ku bîne ziman û dilê dijminê xwe biteqîne fedayiyên xwe rêkirine. Lê na! Tayip û wezîrên wî dibêjin ku fedayiyên Tabûra Nemiran di ser Bakur û Rojhilatê Sûrî re derbas bûne. Bi vê hincetê, bi balafirên xwe yên bê mirov û balafirên xwe yên bi mirov (?!) Heta niha ketin xwîna bi dehan mirovî, bi dehan welatî jî birîndar bûne. Bi sedan milyon zerara madî çêbûye, çendîn kargeh û binesaziya hemwelatiyên herêmê hilweşiye.

Yan jî… ji xwe li firsend û hincetekê digerin da ku êrîşî Bakur û Rojhilatê Sûrî bikin. Dema bêhna xwînê bikeve difna gur, kurmikekî li ser pelê daran jî li ber çavên wî dibe xezal da ku bi xwînxarî êrîş bike. Yan jî halê hazira çîroka gur û berxikê heye, ma çima em wê venabêjin.

Rojekê li pala çiyayekî di nava daristanekê de revdeyeke guran, ji birçiyan bê hal dikeve. Ji nav vê revdeyê, gurekî boz û terî kurt hebûye. Çav li serê wî bûne çala xwînê û ji birçiyan gej û mêj bûye. Ji nişkê ve bêhna xwîna berxikeke li ber şîr, dikeve difna wî. Lê fêm



nake ev bêhna ku wî serxweş dike ji ku tê. Xwe li dawiya revdeya guran dihêle, bi qurnazî û fêlbazî. Berê xwe dide binê dolê, ku aveke boş lê diherike. Çi bibîne baş e! Berxikeke du-sê meh ji beriya vê ji dayika xwe bûye... Bi leza brûskê xwe berdide ser ava boş diherike û li jora berxikê disekine. Bi dengê xwe yî gur û geş dêlî wê dike: "Hêê! Berxika dayika xwe! Ma tu nabînî ez avê vedixwim, çima tu ava min diherimînî?" Berxika ber kozê, dimîne heyirî. Ji ber ku ew li jêr e, û gur jî li jorî avê vedixwe. Dibêje, "mamê gur ez li jêr im û tu jî li jor î. Ma av ê çawa biherime.

Ji xwe derdê gur ne av û herimîna avê ye. Ji berxika nûgihaştî re dibêje, "temam dirêj neke! Ma ne tu buyî dîsa! Par li ser vê avê, min av vedixwar te li jorî min ava min diherimand. Ez ê te bixwim!". Berxik jê re dibêje, "ez dexîlê te me, mamê gur. Hê du-sê mehên min neqidaye ne ku xweda ez dayime. Wer neke, min nexwe." Gur ji birçiyan bi kuzinî; "qut bike dengê xwe yî zelîl û melûl. Eger ne tu yî jî xwişk yan jî birayê te ye yan dayik yan jî bavê te ye." Di encama de li ser wê ava boş û bi delalî diherike bi patika berxikê re digire û li erdê dide.

Hincet xelas nabin!

Ti car!

Ne yên gur, ne yên Tayip Erdogan, wezîr û kizîrên wî. Ma ew nizane, hêlîna teyrûbazan, cih û warê fedayiyên Tabûra Nemiran çiyayên asê ne ku rê nedane Îskenderê Makedonî jî. Dizane! Baş dizane ku Garê, Qendîl, Xakurkê, Zap, Metîna û Avaşîn helîna teyrûbazan e, ew xwişkên Kela Alamût in! Ba û bahoz jî nagihîjin lûtkeyên wan. Diqerîsin û ji hal dikevin. Teyrûbaz bes li wan deran dihewînin, ji deştan re nabin!

# Efrîn an Avrîn bajarekî xwedî dîrokek dirêj e

**Bajarê Efrînê bi bin erd û ser erdê xwe dewlemend e. Her wiha mora xwe li dîrokê xistiye û bûye xwedî mîrat.**

Bajarê Efrînê di nava devereke çiyayî de ye li aliyê bakurê rojavayê Sûriyeyê dikeve nava sînorê Sûriye-Tirkiyeyê. Ji aliyê rojava ve dikeve deşta El Umiq, li navçeya Îskenderûnê û çemê Reş li Efrînê ku xeta sînor li wê deverê xêz dike. Ji aliyê bakur ve xeta tenê ya bi Meydan Ekbez ve ber bi Kilîsê, ji rojhilat ber bi deşta Ezazê û ji başûr ve jî herêma Çiyayê Semaanê ye. Herêma Efrînê herêmeke çiyayî ye û bilindahiya wê di navbera 700-1269 m. de ye, lûtkeya wê ya herî bilind navê wê Çiyayê Mezin e ku beşek ji rêzeçiyayê Torosê li Sûriyeyê ye. Firehiya Efrînê ji rojhilat ber bi rojava ve 55 km. ye û dirêjahiya wê ji bakur ber bi başûr ve 75 km. ye. Bi vî awayî rûbera wê bi qasî 3850 km.2. yanî ji % 2 ji rûbera giştî ya Sûriyeyê ye.

**Erdnîgarî û niştecihên wê**

Herêma Efrînê ji aliyê erdnîgariya xwe ve di navbera deşt û çiyayan de cihêreng e û çemê Efrînê tê re derbas dibe ku li Sûriyeyê 85 km. dirêj dibe û ev çem û şaxên wî yek ji girîngtirîn çavkaniyên avê yên vê herêma çandiniyê tê hesi-



bandin. Herêma Efrînê ji aliyê îdarî ve girêdayî parêzgeha Helebê û navenda wê bajarê Efrînê ye ku 85 km. dûrî Helebê ye. Her wiha ev herêm ji 7 navçeyan (Şera, Bilbilê, Cindirêsê, Reco, Mabeta, Şiyê û Şêrewa) pêk tê û 366 gund girêdayî wê ne. Efrîn ji ber erdnîgariya xwe ya stratejîk herêmeke ji bo çandiniyê bi bereket e. Her wiha çandiniya herî girîng a ku herêma Efrînê pê navdar û sembol e zeytûn in ku li sernaserê navçeyên herêmê tên çandin. Li kêleka çandiniya zeytûnan hemû cureyên fêkî, sebze û dexil li ser axa wê tên çandin.

**Nav û dîroka wê ji ku hatiye**

Efrîn an Avrîn peyveke Kurdî ye û bi wateya afirandin û dayînê ye. Çemê Efrînê bi ava xwe ya herikbar, hê jî çavkaniya jiyanê û berdêlê ye. Dîroka Efrîn vedigere serdema Romayê û Fransiyan di sala 1923'an de ew kirin bajarekî nûjen, niştecihên yekem ên bajarê Efrînê ji Kurd û mîrên Êzidî bûn her wiha beşek ji Ermeniyên ku ji zilma Tirkan direviyan dijiyan û dêra wan li bajêr hebûn. Di serdema dagirkeriya Fransayê de piştî avakirina navçeya Kurd Dag hat avakirin. Hêjayê gotinê ye ku navê Kurd Dag jî Osmanî ye û ev jî di serdema Osmaniyan de girêdayî bajarê Helebê bû, bi Erebî bi navê Cebel El Kurd dihat nasîn.

Şûnwarên dîrokî li ser erd û bin erd gelek in û dewlemend in. Weke ku me di çend nivîsên xwe yên berê ku behsa navçeyên Efrînê kir de, anîn ziman û dîroka wan bi lêv kir. Di navenda Efrînê de çerxeriya Kawayê Hesinkar, çarxeriya Wetanî û Newroz hene lê mixabin dema ku bi armanca guhertina demografîk û çewisandina nasnameya herêmê dewleta tirk a dagirker di 18'ê Adara 2018'an de Efrînê dagir kir hemû nasname û dîroka Efrînê da guhertin.

**Efrîn gelek xweş e**

Şêrîn Ehmed ku ji niştecihên navenda bajarê Efrînê ye behsa jiyana bajêr û adetên wê kir û wiha got: "Adetên Efrînê yên sereke ew e ku hezkirinek di nava şêniyên wê de tê dîtin. Efrîn di nava Sûriyeyê de bi xweza û darên xwe yên çiyayî navdar e. Ew bi navê bûka Kurdistanê tê nasîn. Efrîn bi fêkiyên cur be cur tê naskirin, her wiha sembola wê zeytûn in. Dema ku şêniyên hev ziyaret dikirin zeyt û zeytûn didan hev, ev jî çanda parvekirin û wekheviyê nîşan dide. Ji ber ku Efrîn bi ava xwe navdar e, di havînê de şêniyên wê derdiketin seyranê. Rojên xwe bi hev re weke malbat li ber avê derbas dikirin. Gelek kesan ji derveyî Efrînê dixwestin derbasî herêmê bibin û erdnîgarî û xwezaya wê nas bikin. Jiyana xweş li Efrînê dihat jiyîn, bi taybetî piştî şoreşê Efrîn weke tabloyek mozayîk dihat dîtin ji ber hembêzkirina hemû pêkhateyên civakê û di nav xwe de gelek rengan dihewand. Jiyana wekhev tê de dihat dîtin. Em bi hêvî ne ku ev jiyan li Efrînê careke din vegere û hesreta salan a şêniyên wê bi cih were.

## Têbînî



### Der barê (Rêzimana Kurmancî) de çend têbînî

Kemal Necim

Dawiya Meha cotmehê, Saziya Zimanê Kurdî (SZK) berhema xwe ya bi sernavê (Rêzimana Kurmancî) bi ahengekê da nasîn û belav kir. Berhem weke ji sernavê wê diyar e, der barê rêzimana kurmancî de ye. Li gorî ku rayedarên SZKyê û her du danerên pirtûkê dibêjin, armanca wan ew e ku ev rêziman bibe binyada standartkirina xwendin û nivîsîna bi kurmancî.

Mijara vê nivîsê ne naveroka wê pirtûkê ye, lê helwest û gengeşe û arîşeyên ku piştî belavkirina pirtûkê di nava derdorên rewşenbîr, nivîskar û zimanzanan de derketine.

Ji dema ku pirtûk hatiye danasîn û belavkirin ta niha hîna tenê nêzî 3 hefteyan derbas bûye, ango pirtûk hîna bi berferehî nehatiye belavkirin û xwendin û lêkolînkirin. Lê tişta balkêş hîna çend roj derbas nebûbûn pir kesên ku hîna pirtûk nedîtibûn û nexwendibûn jî helwesta xwe ya li dijî naveroka wê nîşan dan. Tişta mixabinî ye ku helwesta pêşî, yan pirsa pêşî ya pir kesan ew bû; ka danerên pirtûkê kî ne? lewma helwesta pêşî ji bo danerên pirtûkê bû ne ji bo naveroka wê bû. Her wiha beşek kesên ku nêrîn û helwesta nerazîbûn û nepejirandinê nîşan dan li derveyî welêt dijîn û derfet bi dest wan neketiye ku pirtûkê bixwînin, wan jî helwesta xwe li ser hin mijarên bi nakok ên di pirtûkê de ava kirin, mîna mijara awayê xwendin û nivîsîna daçeka (de -da)yê û ev helwesta xwe avêtin ser tevaya naveroka pirtûkê.

Beşek jî heye ku ne pisporê ziman û rêziman in, bi qasî zanebûna xwe şîrove dikin û helwestên xwe jî nîşan didin.

Ji xwe em behsa wan nakin ew ên ku bi dûrbînî, dilnizmî û bêhnferehî rahiştin berhemê û hewil didin ku serwextî naveroka wê bibin.

Despêkê hêjaye mirov bêje ku ev gengeşeya der barê pirtûkê de çêdibe ne rûdaneke neyênî ye, berovajî dê bibe bingeha berferhbûna gengeşeyê û pirbûna nêrînan û dê rê li ber destnîşankirina kêm û kurtiyên berhemê veke.

Mijara standartkirina nivîsîn û xwendina bi kurmancî her daxwaz û xwesteke kurmancîaxêfan bû. Lewma ji bo ku ev xebat têkeve ser rêyekê pêwîstî bi gava destpêkê hebû. Gavên destpêkê yê herî zor û zehmet in, zimanzan, xwêner, rewşenbîr û nivîskar jî pêwîste lingên xwe nedin ber vê pêngava pêşîn, pêwîste bi bêhnferhî û dilnizmî bişopînin rêya wê hêsan bikin û li ku derê şaşî yan kêmasî heye rast bikin da ku ev pêngav bighêje dawiyê.

He wiha danerên berhemê jî, çi sazî dibe çi kesayet, ew jî pêwîst e bi bêhnferhî û dilnizmî guh bidin xwêner û zanayan, nebêjin ku ev berhem ya herî baş û dawî ye, bi ferman û biryaran li ser civakê ferz nekin, li ku derê kêmasî hate destnîşankirin pêwîste guhdar bikin û hewil bidin rast bikin.

Niha ev berhem bû ya me hemûyan, em hemû hewcedarê vê berhemê ne, tişta ku dê barê me yê rastnivîs û rastxwendinê sivik bike emê bi kêfxweşî pêşwazî bikin, tişta ku dê barê me giran bike û ziman li ber me asê bike emê xêzeke têbîniyê bavêjin binî û arasteyê danerên wê bikin.

# Dadgeh parêzvanê mafê civakê ye

Hevserokê Meclisa Dadmendiyê li Herêma Cizîrê Hisên Fatimê diyarkir ku peywendina wan bi civakê re xurt e, û got ku ew bi hemû awayî hewildidin ku bi riya komîteyên lihevhatinên civakê pirsgirêkan çareserbikin û têkiliyên xwe bi civakê re xurtir bikin.

**Berçem Silêman/Qamişlo**

Di derbarê kar û xebatên dadgehê de Hevserokê Meclisa Dadmendiyê li herêma Cizîrê Hisên Fatimê bersiva pirsê rojnameya me da.

**Bingehên qanûnî û hiqûqî di xebatên dadgehê de**

Sîstema dadmendiyê li ser perensîpên exlaqî, siyasî, civakî hatiye avakirin û di nava xwe de civakê esas digre. Herwiha armanca Sîstema heyî avakirina civakeke li ser fikrê Netewa Demokratîk a di nav civakê de û parastina mafê mirovan, jîngeh û azadiya jinê. Di serî de van xalan esas digre, li gor felsefa, fikir û remanê Netewa Demukratîk tevdigere. Li ser bingehê wijdana civakê û bi peymana civakî pirsgirêk têne çareserkirin. Em xwedispêrên perensîpên mirovî û exlaqî û hewil didin di navbera civakê û dadgehê de hevsengiyekî avabikin. Pirsgirêk an jî sûcên ku rûdidin bi rengekî axlaqî û mirovî û li gorî pîvanên dadgehê têne çareserkirin û hewildan ew e, ku pirsgirêk mezin nebe û di zûtirîn dem de were çareserkirin. Herwiha gava doz tê pêşiya dadgehê çi medenî be çi jî ceza yî be, li gorî zagonên girêdayî wê nêzîkbûn jêre tê çêkirin. Heger doz medenî bê bi riya komîteya lihevanînê, komîta dîwanê, yekîtiya ofîsên erebeyan û yekîtiya ofîsên kirîn û firotina xaniyan li pêşiya dadgehê nêrîna xwediyê pirsgirêkê tê guhdarkirin. Ger ku doza cezayî be civak bi vê pirsgirêkê hatibe êşandin pilatforim çêdibe û radestî desteya bilatformê tê kirin. Di destpêkê de pêşinyar tên standin û biryara dawî ji gel re tê hiştin û armanca me ji vê yekê ew e, ku civak bi xwe bibe hêza çareseriyê û biryardayînê. Li gorî rewşa heyî desteya qesemkar dibîne ka sûnc heye yan na, sîstema dadmendiyê li Bakur û Rojhilatê Sûriyê cûda ye ji ya hikumeta Sûriyê. Li cem dewletê zagonan pêktînin bêyî ku nêrîna civakê têde hebe, lê li Bakur û Rojhilatê Sûriyê mafê mirovan esas tê girtin û bi riya civakê hemû pirisgirêk têne çareserkirin.




**Giliyên ku têne dadgehê şopandina van giliyan çawa tê şopandin û li ser tê seknandin?**

Gilî tên pêşiya dadgehê û di çend qonaxan re derbas dibe, heger cezayî be diçe niyabê,dîwana edaletê û temiyîzê. Biryara dawî gava ji cem temiyîzê derdikeve çi sûnc cezayî be çi medenî be heger aliyek hebe nerazîbe wê demê doz diçe ber destê meclisa jêr daxwaziya hevkariyê radike cem meclisa me û desteya mûxasemê, ev deste doza bingehîn tîne û dixwînin, di ber çavan re têderbaskirin ka heyanî çi astê ev biryar di cihê xwe de ye, an na û herger rast be nerazîbûn qebûl nabe. Lê heger şaşbûn têde hebe wê demê desteya mûxasemê biryarê ji nû ve dide. Dema gilî hat û şaşbûnek têde hebe, em wê gavê hildidin ji rêveberiya cîbicîkar re û li ser wê dozê tê seknandin û dema ku kuncaw were dîtin nêrîn li ser tê dayîn, lê herger doz li pêşiya dadgehê be ji bona desteya dadmendiyê tê hildan û ew wê dozê dişopîne û dibîne heya çi astê karê dadgehê di cihê xwe deye yan na. Hger karê dadgehê di cihê xwe de bê ew gilî qebûl nabe. Lê heger karê dadgehê nedicihê xwe de be wê demê komîte wî gilî qebûldike û sererast dike. Bi giştî meclisa dadmendiyê ya herêma cizîrê karê dadgehan dişopîne û dinêre heta çi astê karê dadgehê li gorî zagon, felsefeya Netewa Demokratîke, pîvanên dadmendiya civakê ye û li ser bingehên exlaqî, qanûnî û hiqûqî birêvediçe, wê demê li gor peradîgmeya karê dadgehê tê nirxandin û şîrovekirin.

**Komîteya lihevanînê û dadgeh bi hevre kar dimeşînin**

Di destpêka ku dadgeh avabû karê wê lihevanîn bû, li gorî vê yekê tê xuyakirin ku kumîteya lihevanînê ji bona çareserkirina pirsgirêkên civakî navnîşana bingehîne. Hemahengiya ku di navbera dadgehê û komîteya lihevanînê de xurt e. Heger dadgeh bibîne gava dozek li ber çavan bê girtin û niyeta lihevhatinê li cem herdû aliyan hebe, di vê rewşê de dadgeh demekî dide wan heya lihevwerin û pirsgirêka wan çareserbibe. Lê heger ev doz çaresernebe di vê rewşê de dadgeh bikarê xwe radibe, lê cardin hiwildide ku biryar ji aliyê civakê ve were dayîn da ku pirsgirêk bi riyên civakî were çareserkirin.

**Armanca dadgehê qezenckirina baweriya civakê ye**

Herweha dema ku doz tên pêşiya dadgehê du alî tê destgirtin, aliyê ku sernakeve di dozê de hertim neraziye. Lê dema piraniyên dozên milet bi riya saziyên rêveberiya xweser, wê demê baweriya gel bi dadgehê bêtir dibe. Herwiha çi ji milê qanûnî ve be an jî ji milê hiqûqî ve be, heyanî astekî mafên takekesî û civakê têne parastin. Dema ku civak di derbarê dozan de xwedî nêrîn be û nêrîna wê di ber çavan re were girtin, wê demê ev yek li cem civakê li hemberî kar û xebata dadgehê baweriyê dide avakirin û wê gavê civak xwe bi xwe rêxistin dike.



**Sûcên ku têne berdestê dadgehê û riyên çareseriyê**

Sûcên ku di asta yekêdene û tên pêşiya dadgehê piranî sûcên madeyên hişbirin, ev made ji milê dijmin ve di nava civakê de têne belavkirin da ku di serî de jin û ciwan pê pandor bibin. Ji ber vê yekê zagonên me di vî aliyê de hişkin û li ser û em li ser disekinin. Herwiha di asta duyem de qaçaxçiyên mirovan pir tên pêşiya dadgehê, sûcê siyem jî diziya ku di van demên dawiyê de di nava civakê de pirbûye û sedema bingehîn jî rewşa abûrî ya ku herêm têre derbas dibe. Hin dozên sextekariyê jî tên pêşiya dadgehê, sûcên qezayên Tirafîkê, yên şer û pevçûnan jî têne ber destê dadgehê.

# ‘Êrîşên dagirkeriya Tirk bandoreke neyênî li belavkirina mazotê kir’

**Hemza Sêvo/Qamişlo**

**Hevseroka Desteya Sotemeniyê Bakur û Rojhilatê Sûriyê Ebîr Xalid diyar kir ku êrîşên dagirkeriya Tirk hiştin ku pêvajoya belavkirina mazotê li welatiyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê derng bikeve, lê niha mazot li şêniyan tê belavkirin û rêjeya belavkirinê 40 ji sedî derbas kiriye.**



Desteya Sotemeniyê a Bakur û Rojhilatê Sûriyê pêvajoya belavkirina mazota germkirinê li şêniyên herêmê didomîn. Wekî ku em dizanin di destpêka Cotmeha borî de dagirkeriya Tirk binesaziya herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi taybet bîrên petrolê û stasyonên gaz û elektrîkê hedef girt. Êrîşên dewleta Tirk a dagirker a li ser navendên petrolê yên li herêma Cizîrê bû sedema ku belavkirina mazotê li ser welatiyan dereng bikeve û rêjeya berhemdayîna van navendan jî kêm bibe.

Hêjayî gotinê ye ku Desteya Sûtemeniyê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê ji bo her malbatekê 300 lîtreyên mazotê da destnîşankirin û buhayê lîtreyeke mazotê jî 325 leyreyên Sûrî ye. Îsal jî wekî her sal belavkirina mazotê li gel ji pirojeyên Desteya Sûtemeniyê bû û weke amadekariyeke ji bo demsala zivistanî hat destpêkirin. Têkildarî mekanîzma belavkirina mazota germkirinê û derengmayîna belavkirina wê li şêniyan, Hevseroka Desteya Sotemeniyê a Bakur û Rojhilatê Sûriyê Ebîr Xalid ji rojnameya me re axivî.

**‘Êrîşên dagirkeriya Tirk bandoreke neyînî li belavkirina mazotê kir’**

Ebîr Xalid diyar kir ku êrîşên dewleta Tirk a dagirker pêvajoya belavkirina mazotê li şêniyan dereng xist û wiha got: “Di çarê Cotmeha derbasbûyî de, dagirkeriya Tirk êrîşên xwe li ser herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê dijwartir kirin. Binesaziya herêmên me awayekî serke hat hedef girtin. Êrîşên dewleta Tirk a dagirker bandoreke mezin li hemû karên saziyên Rêveberiya Xweser kir. Bi taybet Desteya Sotemeniyê û pêvajoya belavkrina mazota germkirinê ya zivistanî. Dagirkeriya Tirk stasiyon û bîrên petrolê kirin armanc û ji xizmetê derxistin. Ev yek jî bû sedema ku belavkirina mazotê were derengxistin û astengî derkevin pêşiya malbatan. Niha belavkirina mazotê li gel di berdewamiyê de ye û rêjeya belavkirina mazotê li gel bi giştî ji sedî 40 derbas kiriye. Herwiha rojane 133 sehrîjên mazotê ji saziyên sivîl ên Rêveberiya Xweser û Demokratîk ên Bakur û Rojhilatê Sûriyê re tên belavkirin”

**‘Ji ber pirsgirêkên teknîkî bernameya belavkirina mazotê hat nûkirin’**

Derbarê mekanîzmaya belavkirina mazotê ya germkirinê de, Ebîr destnîşan kir ku ev yek bi riya kerta elktonî û bernameya ku hat nûkirin tê kirin û wiha anî ser ziman: “Pêvajoya belavkrina mazotê bi awayekî pêşketî tê meşandin, ku bi riya kertên elektronîk mazot tê belavkirin. Derxistina kerta elektronîk ji bo her malbatekê riya herî hesan ji belavkirina mazotê re ye. Ev yek bi xurtkirina têkiliyan bi komîn, meclîs, komîteyên têkildarî sotemeniyê yên Rêveberiya Xweser re tên çêkirin. Êdî bi vî awayî mazota germkirinê ya demsala zivistanî li hemû gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê tê belavkririn. Dema mazot tê belavkrin hin kes carcaran hewl didin ku sextekariyê di wergirtina mazotê de dikin. Lê bi riya vê kertê her welatiyek mafê xwe yê bidestxistina madeya mazotê dibe. Bernameya elektronîk ya belavkirina mazotê îsal hate nûkirin û pêşxistin. Ji ber ku hin kesên sextekar hewl didan ku sextekariyê di bernameyê me de bi kar bînin, ev bername hat nûkirin. Destpêkê hin alozî û prisgirêk di nav bernameyê de hebû, van kesan jî ev alozî ji bo xizmeta xwe bi kar tanî, ku ev yek jî dibû sedema xerçkirina mazotê. ”



# ‘Bi şoreşê wê têkoşîna jinan bi ser bikeve’

Bi wesîleya 25’ê Mijdarê Roja Piştevanî û Têkoşîna li dijî Tundiya li Jinê, Partiya Azadiyê ya Jinê ya Kurdistanê (PAJK) di hevpeyvînekî de rewşa heyî nirxandin kir.




**Navenda nûçeyan**

**Naveroka hevpeyvînê wihaye**

**Bi nêzîkbûna 25’ê Mijdarê Roja Têkoşînê ya Navneteweyî ya li dijî Tundiya li Jinê hûn polîtîkayên tundiyê yên AKP-MHP’ê çawa dinirxînin ku weke hikumeta şer a topyekûn xwe bi rêxistin kiriye?**

Bi wesîleya 25’ê Mijdarê Roja Têkoşînê ya Navneteweyî ya li dijî Tundiya li Jinê, di şexsê xwişkên Mîrabel de ku sala 1960’î li Komara Domînîk ji ber ku serî li ber rejîma dîktator netewandin û piştî destavêtinê hatin qetilkirin, hemû jinên ku li tevahiya cîhanê li her qada jiyanê li çiyê, li kolnanan, li zindanan li ber xwe didin, silav dikin. Ji bo tundiya li jinê were dîtin, mîna 8’ê Adarê Roja Jinên Kedkar ên Cîhanê ev roj jî vediguhere kevneşopiyeke girîng a têkoşîna jinê. Dema ku mirov li destketiyên vê yekê dinihêrin, dibînin ku her sal têkoşîna jinê hîn bêhtir bi pêş ve dibe û wê bi pêş ve bibe. Li gerdûnê her bûyer, her tecrûbe bandorê li hev dike, lewma çîroka kevneşopiya me ya têkoşînê ji Roza Luksembûrg heta Sakîne Cansizan, ji Xwişkên Mîrabel heta Jîna Emînî, li çiyayên Kurdistanê bi çeka gerîlayên me yên YJA Starê, li metropolan, li kolanan bi qîrîna jinên berxwedêr, bi hêviya jinên şoreşger ên li zindanan li ber xwe didin tê nivîsandin. Ev têkoşîna ku her gel, her dînamîka têkoşînê bi pênûsa xwe dinivîsîne weke nivîskarên kolektîf û bênav dîroka jinê diafirîne. Weke PAJK’ê di vê têkoşîna xwe de ku bi xwîna şehîdên leheng hate afirandin û rêya têkoşîn û berxwedanê nîşanî me dide, heta ku jineke bi tenê kole û bindest bimîne em ê xwe azad nebînin. Teqez heta azadiyê em ê vê çîrokê binivîsînin.

Dewlet rêxistinyeke tundiyê ye, lewma nêrîna ku dikare dewletê di nava sînorê qanûnên xwe de, bi legalîzm an jî hilbijartinê dikare bê têkbirin, korbûyîneke polîtîk e. Bi dîtina me divê pêvajoya ku Rêberê me weke dînamîka darbeyê pênase dike, baş bê nirxandin. Em dibînin ku dînamîka darbeyê ku tundiya herî şênber e li gorî salek berê çawa zêde bûye. Pêvajoya ku bi êrîşên li ser Rêbertî û gerîla destpê kir, li dijî têkoşîna legal a Kurdan, şaredarî, siyasetmedar, piştre jî li hemberî demokratên şoreşger, tevgerên jinan, akademîsyenan belav bûye. Her êrîşeke ku îtiraz û nerazîbûna me li hemberî wê lawaz be, wê bibe sedema rûdana êrîşên hîn mezintir. Mîna ku di helbesta navdar a Brecht de hate gotin, ‘Destpêkê komunîst birin, min dengê xwe nekir. Piştre Yahûdî birin min dengê xwe nekir. Piştre çîngene birin, min dengê xwe nekir. Dema ku dor hate min, kes nemabû ku dengê xwe bike’. Lewma faşîzm ti carî yekser êrîşî temamiya civakê nake. Parçe bi parçe, li gorî nerazîbûnan êrîş dike.

Ji bo têkbirina faşîzmê şert e ku tundiya şoreşgerî, birêxistikirina zorê û têkoşîna li ser vê bingehê bê meşandin. Ji bo KBDH rola xwe ya dîrokî bi cih bîne, dem ev dem e. Lewma divê KBDH ji her demê bêhtir xwe bi rêxistin bike. Ji çalakiyên çekdarî heta bi çalakiyên kolanan divê çalakiyên dewlemend di vê demê de bêne birêxistinkirin.

**Li dijî terora mêr-dewletê ji bo tevgerên jinan berxwedan û piştevaniyeke bi çi rengî hate birêxistinkirin?**

Li gorî daneyên Neteweyên Yekbûyî li cîhanê her saetê 5 jin ji aliyê xizmên xwe ve têne kuştin. Yanî rojê 120 jin, mehê 3600 jin û salê jî 43.000 jin ji aliyê mêr, hevjîn, hezkirî, bavê xwe ve têne kuştin. Bêguman gelek cûreyên tundiyê hene. Dema ku mirov kuştina jinan a ji ber tundiya aborî, siyasî, xizanî, girtin, binçavkirin, êşkence, şer, komkujiya sivîlan, kuştinên polîtîk ên li protestoyên civakî lê zêde dikin ku kiryarên bingehîn ên van hemûyan jî dewlet a mêtinger faşîst e, rewş hîn bêhtir metirsîdar dibe. Ji ber vê yekê me komkujiya jinê weke ‘qirkirina jinê’ pênase kirin. Lewma pêwîstiya me bi berxwedan û piştevaniyheke çawa heye, bi çi rengî pêşî li komkujiya jinan dikare bê girtin, bersiva van pirsan girîng e. Tevgerên jinê ku di serdema me de bi pêş ketine û gihîştine dînamîzmeke girîng, îsal jî têkoşîneke girîng meşandin. Têkoşîna me ya jinê ku her sal dibe xwedî tecrûbeyên cuda, daxwazên ji salek berê bêhtir, lêgerîn û rêbazên nû dane pêş. Eger mirov van bi bîr bixînin, bi vî rengî ne:

1- Di daxwaza mafê wekhev de di lêgerînên nava sîstemê de guherîn pêk hat. Girîng bû ku hate dîtin; mafên li nava sîstemê hatine bidestxistin nikarin bêne parastin; bi qasî bidestxistina maf, her wiha mayindekirina wan jî pirsgirêka bingehîn e. Weke PAJK’ê bi salane em diyar dikin ku têkoşîn û keda ji bo lêgerîna li maf a li nava sîstemê xapandineke, divê jin berê xwe bidin lêgerîneke li derveyî sîstemê. Di serî de li Tirkiyeyê li gelek dewletên Rojhilata Navîn maf ji dest çûn, ji dest diçin. Sîstema dewletê ya mêr destkeftiyên me yên ku bi têkoşîna bi salan hatine bidestxistin di şevekê de dikare desteser bike. Peymana Stenbolê jî yek ji wan bû.

**Şoreşa gerdûnî ya bi pêşengiya jinê dikare pêk were**

Di dema bê de weke pêkhateya KBHD-PAJK’ê ji bo bilindkirina têkoşîna şoreşê ya yekbûyî armanca we çi ye? Banga we ji bo tevgerên jinan çi ye?

Sîstem di nava krîzeke bingehînî de ye. Ev pêvajo dişibe destpêka sedsala 20’an. Ne şaş e ku mirov weke şerê parvekirinê yê emperyalîst ê 3’yemîn pênase bikin. Lewma firsend heye ku di vî şerî de têkoşîna maf a jinan, bindestan û gelan veguhere şoreşeke civakî. Lewma weke hêzên şoreşger pozîsyona me ne ew e ku di nava hêzên şer dikin de tercîhekê bikin, pozîsyona me wê diyarkirina rêya xwe be. Stratejiya rêya 3’yemîn bersiva me ya rast e. Bala xwe bidin ser, beriya Şerê Cîhanê yê 1’emîn helwesta Enternasyonal a 2’yemîn bi bandora Partiya Demokrasiyê ya Civakî ya Elman biryara cihgirtina li gel dewletên xwe yên netewe bû. Di rewşeke bi vî rengî de Spartakîstan û Bolşevîkan bêyî ku xwe bidin aliyekî, rêya xwe ya têkoşînê diyar kirin. Stratejiya ku di şerê emperyalîstan de diyar kir bi şoreşa Cotmehê bi encam bû. Ev mînak bi dersan dagirtî ye ku stratejiyên di dema rast û cihê rast de tê diyarkirin firsendan diafirîne. Eger em naxwazin tevlî polîtîkayên dewletên netewe yên serwer bibin û bi ser bikevin, hingî weke KBDH divê em rêya xwe diyar bikin, rêyeke nû destnîşan bikin.

Li hemberî komkujiyên jinan ne tenê birêxistinkirina nerazîbûnan, di heman demê de nîşandana helwestên radîkal û bi hişmendiya xweparastinê birêxistinkirina vê têgihiştinê girîng e. Milîsên me yên çekdar ên jinê ku li Tirkiye û Bakurê Kurdistanê xwe bi rengekî îllegal bi rêxistin kirine, dikarin mêrên ku jinan qetil dikin ceza bikin, ku ew mêr weke hêza dewletê êrîşî jinan dikin.

Ji aliyê stratejîk ve weke rêxistinê ya ku me destnîşan kiriye xeta rêya 3’yemîn e. Destketiyên vê xetê ji aliyê gelê Kurd ve şoreşa Rojava ye ku bi pêşengiya jinê pêk hat. Lewma em dibêjin ku şoreşa Rojava şoreşa jinê ye. Weke KBDH bi dersên ji şoreşên derbasbûyî wergirtî divê em derfetên şoreşa Rojava bi kar bînin û rêxistiniya xwe xurt bikin.

Ji her demê bêhtir derfet hene ku em bi jinên ji gelên cuda re bibin yek, bibin alternatîf û şoreşa gerdûnî ya civakî ya bi pêşengiya jinê pêk bînin. Di demekê de ku sîstem di nava krîzê de ye, demokrasiya sexte ya bûrjûva têk çûye, li her devera cîhanê jin li hemberî komkujiya jinê serî hildidin û gel li pey hêviyeke nû ne, KBDH ji her demê bêhtir dikare bi rola xwe ya pêşengiyê rabe, bibe hêzeke gerdûnî ya civakî.

# Êrişên Îsraîlê ya li dijî Xezayê 38 roj li pey xwe hiştin

**Êrîşên Îsraîlê yên li dijî Xezayê ku 7’ê Cotmehê dest pê kirin, 38 roj li pey xwe hişt. Di êrîşên ku heta niha berdewamin, nêzî 5 hezar zarok, 3 hezar jin jî di nav de, zêdeyî 11 hezar Filistinî hatine kuştin û herî kêm 30 hezar kes jî birîndar bûne.**



Di 7’ê Cotmehê de artêşa Îsraîlê li dijî Xezayê êrîşeke hewayî û bejahî ya berfireh da destpêkirin. Li gorî amarên fermî yên Wezareta Tenduristiyê ya Xezayê di êrîşên ku heta niha dewam dikin zêdetirî 11 hezar Filestînî hatine kuştin û hijmara birîndaran jî 30 hezar derbas kiriye.

Di êrîşên Israîlê yên li dijî Xeze tevahiya nexweşxaniyan jî hatin hedfgirtin, balafirên şer yên Îsaraîl bi awayekî domdar nexweşxane , kampên kuçberan û her devrê li Xezayê bombaran dike.

Li aliyekî din di 9 Mijdarê de Rêxistina Mirovî ya Neteweyên Yekbûyî (UNRWA) ji ber berdewamkirina şerê li Xezayê hişyariya rûdana karesata mirovî da. Rêxistinê bi daxuyaniyekê destnîşan kir ku ji dema destpêkirina şerê Hemas-Îsraîlê ve 100 karmendên wan jiyana xwe ji dest dane. Di daxuyaniyê de hat gotin ku ev hejmara herî zêde ye ku endamên wan di şerekî de jiyana xwe ji dest didin.

UNRWA’yê da zanîn li Xezayê rewşa mirovî her ku diçe xirabtir dibe û pêwîste di zûtirîn dem de alîkariyên tendirustî bigihînin nexweşxaneyan. Serokê UNRWA’yê Phîlîppe Lazzarînî di daxuyaniya xwe ya li ser hesaba X de diyar kir ku di nava mehekê de zêdetirî 100 xebatkarên UNRWA’yê hatine kuştin.

Lazzarînî diyar kir ku ev dayik û bav, mamosta, hemşîre, bijîjk, karmendên alîkariyê ne û got: “UNRWA şîn digre, Filistînî şîn digrin, Îsraîlî şîn digrin. Ji bo dawî li vê trajediyê bînin pêwîstiya me bi agirbesteke mirovî ya bilez heye.”

Di heman çarçoveyê de Heyva Sor a Filistînê di 12 Mijdarê de ragihand ku Nexweşxaneya El Qudis a li Xezayê ji xizmetê derket, her wiha berdevkê tenduristiyê anî ziman ku li Nexweşxaneya Şîfa cenaze li ser hev kom bûne.

Berdevkê Wezareta Tenduristiyê ya Xezayê Eşref El Qudre diyar kir ku Nexweşxaneya Şîfa ya li bakurê Xezayê nikare tu xizetmguzriyekê pêşkêş bike, ji ber ku hemû derfetên neman, kehrebe qut bû û ji hêla tankên Îsraîlê ve hate dorpêşkirin.

El Qudre diyar kir ku rewşa li derdora nexweşxaneyê‘qada şer e’ û got rewşa nexweş dijîn nayê wesifkirin û cenaze hem li hundir hem jî li derveyê nexweşxaneyê kom bûne û kesek tune wan veşêre.

# 22 Rojên Binçavkirina Silêman Ehmed 33 salên îxaneta PDK’ê vedibêje

Rojname û rojnamegerî di hemû beşên jiyanê de xwedî roleke girîng in, erkê her rojnamevanekî ew e ku Maske û perdêyan ser heqîqetê daxîne, sirên ku divê mirov bizane bigihêje wan, da ku helwest di cihê xwe de xuya bibe.Heya xelk karî bin Rastî û ne Rastî ji hev cudabikin û nasbiken.



Ev pênaseya standard a rojnamevaniyê ye di cîhana îro de, ku êdî rastî nayê veşartin û bi Duv û guhên zêde nayê qebûlkirin. Di van rojên dawî de li Şerê Israeil Fîlstin de li  Gazzeyê nêzî 45 rojnameger hatin kuştin. Ev di demek deye ku Her sal rojnameger li herêmên cuda rastî tacîz, tehdîd û sûcdariyên sexte tên. Tenê sala borî li gorî amarên nefermî 514 rojnamevan li Rojhilata Navîn ji aliyê sîstemên dewletî û serdest ve  bi hincetên cur bi cur wenda bûne û hatine girtin.

**Hîkumeta Başurê Kurdistanê**

Ji roja avabûna statûya xwe vir ve, Her sal hema hema Em dibin Şahidê Mînaka Girtin û Binçavkirina rojnamevanan ji tirsa hilweşîna Systema Hikumkirina pir israr û tije Istixbarat. Li aliyeka din ji Medyayên Azad sansûr dike û çalakvan ên Azadîxwaz û rojnamevanên wek Kawa Germiyanî, Serdeşt Osman û Soranî Mama heme dikuje, yan jî terorîst îlan dike û wan bi kesayetî û exlaqê wek Omîd Baroşkî û hevalên wî tawanbar dike.

Rojnamegerê Rojavayê Kurdistanê Silêman Ehmed ev 22 roj in winda ye. Ji bilî wê yekê ku PDK’ê piştrast kiriye ku rojnamevan Silêman Ehmedî di girtîgehê wan de ye, ti agahî derbarê wî de nînin.

**‘Li gori hikûmeta PDK’ê her kesê ku li dijî hegemonyaya Tirkan kar bike terorîst e’**

Li Başûrê Kurdistanê çi rojnamevan be, çi çalakvan be û heta mirovekî asayî be. Bi biryara dadgeha PDK’ê raste rast  tên girtin û wan dibin  girtîgehê. Kesên ku nikaribe sûçdar ji bike an wan binçav bike. Bi aliykarê Hêza xwe ya îstixbarat PARASTIN wan kesayetan Tiror dike mînakê wan Endamê HDP’ê Mamoste Denîz û Endama Jinolojiyê Nagîhan Ekarsel Ku rastî Tîroreka Reş hatin heta Anha tu kesî bi sedema wan nehatine Darizandin. Heta Ev Rêbazê Qedexe li ser pranî sazî û navendan jî Derbasdare Ji Girtina Navenda HDP’ê li hewlêrê heta Kilîtkirina Medyayên Ragîhandinên aliyên din jî tên astnegkirin.

**Silêman Ehmed ji Efrîn heta Şengal xebatê Ragîhandinê Da meşandin**

Mala Silêman Ehmed a li Efrînê di sala 2018’an de wêran bû û weke bi sed hezaran kesên din koçberî herêmên din ên Rojava bûn. Birayê Silêman Ehmed di şerê li dijî DAIŞ’ê de şehîd bû. Silêman ji bo ku rastiyan nîşanî cîhanê bide, li ser sûc û jenosaîda ku DAIŞ’ê û rejîma Erdogan li Kurdistanê bi taybet li Rojava pêk anîne, Xebatên Ragîhandinê da destpêkirin, belge û dosya çêkirin. Ango li hember terorîst û sûcdarên DAIŞ’ê berpirsyariyê digre ser milê xwe, li ser esasê ku exlaqê baş hem di kar û hem jî di jiyanê de tevgerên mirov ber bi serkeftinê ve dibe. Li hember nebaşiyê wê bi serdixe.

**Li vir pirsek dibe strî û Zihnyeta wan diqelişine!**

Gelo kesekî di Qada Ragîhandinê de ji bo belgekirina destên reş û terora DAIŞ’ê xebat kiriye!. Kesê ku qirkirina Efrîn û Serêkaniyê sûcê mirovahiyê belge kiribe! Kesê ku belgeyên jêkirina darên zeytûnan û kolekirina jinan li Şengalê nîşanî raya giştî û cîhanê da! Di kîjan ferhengê de ev kes terorîst e? Çawa dibe Têgîna terorîst wisa ser keyfa xwe em biden ser Rojnamevan û xebatkar û kadroyên çapemeniya azad ku israra serxistina Azadî dikin. Gelo  PDK’ê bi bêdengiya li hemberî doza Silêman Ehmed ji bilî reşkirinê zêdetir rûyê hikûmeta xwe û kurkirna zulmetê  dikare çi bi dest bixe!?

Başûrê Kurdistanê piştî 33 salên desthilatdariyê bûye bi(2 eniyan) Eniyek ya hikûmetê ye, medyaya hikûmetê û saziyên hikûmetê û Îstixbarata Hîkumetê. Li aliyek din  eniya gel, medyaya gel û navenda gel. Hemû ew navend, sazî û kesayetên ku dijî Sistemêne û sistemê rexne dikin, tercîha wan a yekem Gotina (na)ye. Ji aliyê dewlet, dadgeh û hêzên wê yên îstixbaratê ve tên windakirin û qetilkirin.

Di astekî de ku ji cîhê ku Çapemenî û gel têkiliya wan xurtbe herî zêde navbera saziyên îstixbarat û çapemeiyê bi hevre kar dikin. Pranî endamên navendên çapemeniyê li Başûrê Kurdistanê bi taybet herêma bin serweriya PDK’ê de endamên navendên asaîş û DEZGEHA PARASTIN ê ne.

**Rewşa çapemeniya Başûrê Kurdistanê**

22 rojin ku silêman Ehmed hatiye Girtin, lê heya neha bi awayekî Seranser ev Rojev tê belavkirin ji bilî çend rojnamevan û saziyan tu kes xwedî li erkê xwe yê Rojnamevantiyê dernakeve û doza Silêman Ehmed lêpirsîn nake. Ev jî sedemê wê ewe ku Hejmara zêde ya çapemeniya mecazî ya ku cihê xwe di nava civakê de digre bûye bi Henek û pêkenok, dibêjin ji ser her kolanek Markêtek û medyayek heye!.

Di nava ew qas hejmarên zêde yên çapemeniyê de, girtina çalakvanên civakî heta tecawiza ser jinan terora ser rojnamevanan navê mjarê lêpirsîn e. Yên ku pey lêkolîn û vekirina mjarên ku serê wan hatiye girtin dikevin, qederek tarî û çavkorî dibe nesîbê wan. Berpirsyarê wê yekê jî hikumeta PDK’ê ye, ji ber ku ew Tirs, Teror û Revandinê di nava karê ragihandinê de daye tesbît kirin.

Silêman Ehmed ne yê yekê ye û ne jî yê dawî ye ku ji ber Derewên sar û propagendeya zuha hatiye Binçavkirirn. Lê heta kengê em ê van manşêtan di rewşa herêmek qaşo kurdî ye tê de bibînin? Ferqa vê yekê li gel darvekirin û hucreyên takekesî yên li Tirkiyê û Îranê û windakirina azadîxwaz û rojnamevanan çi ye? Em dikarin ewqas bêdeng bin û li asoya xeyalî binêrin! An jî divê em hemû li her çar parçeyan weke çalakvan, rojnamevan, parêzer, rewşenbîr û hemû pêkhateyên cîvakê dengê xwe bixin kêleka dengê Silêman Ehmed û hemû rojnamevanên li Behdînanê hemû girtiyên ku bi neheq bê darizandin hatine mehkûm kirin di nav de Silêman Ehmedî yê Efrînê, azad bikin û azadiyê bikin pîvanê karê xwe yê çapemenî û jiyanê!

# ‘Bi revandina rojnemevanan heqîqet nayê veşartin’

Zana Roj/ Şehba

**PDK’ê bi revandina rojnemevan Silêman Ehmed,zagonên navneteweyî yên parastina mafê rojnemevanan binpê dike. Rojnemevanên herêma Şehbayê diyar kirin ku PDK’ê bi revandina rojnemevanan dixwaze dengê heqîqetê bêdeng bike û gotin, divê rêxistinên navneteweyê yên parastina mafê rojnemevanan li hemberî revandina rojnemevan Silêman Ehmed bê deng nemînin.**

Rojnemevan û edîtorê beşa Erebî ya ajansa ROJnews’ê Silêman Ehmed roja 1’ê Cotmehê ji bo serdanê çûbû cem malbata xwe ya li Taxa Şêx Meqsud a Helebê. Silêman roja 25’ê Cotmehê dema xwest di ser deriyê Pêş Xabûr (Sêmalka) re derbasî Başûr bibe, ji aliyê hêzên PDK’ê ve hat revandin û heta niha tu agahî jê nayê girtin.

Hefteyek piştî windabûna Silêman Ehmed, asayîşa PDK’ê ya Dihokê bi daxuyaniyek  tejî berovajîkirin û nerast gotin ku qaşo revandina rojnamevan Silêman Ehmed ‘ne ji ber karên wî yên rojnamevaniye’ û bi eşkere gefa cezakirinê li rojnamevan Silêman kirin û îtiraf kirin ku wî revandine.

Silêman Ehmed nêzî 5 salin di beşa Erebî ya ajansa ROJnews de wek edîtor dixebite.

Roj bi roj bertek û helwestên dijî revandina Silêman Ehmed zêde dibin, herwiha  her ku diçe guman û fikarên li ser jiyana Silêman Ehmed zêde dibin. Rêvandina Rojnemevan Silêman Ehmed ji Aliyê PDK’ê ve ji siyaseta qirkirinê ya dagirkeriya Tirkiyê ne dur e. Çawa ku bi sedan rojnemevanên Kurd yên li pey eşkerekirina heqîqetê meşiyane di zîndanên Tirkiyê de ne, PDK’ê jî wê xetê diparêze.

Derbarê Rêvandina rojnemevan Silêman Ehmed ji aliyê PDK‘ê ve, nûçegihana Ronahî TV Nede Ednan û nûçegihanê Çira TV Mistefa Reşo ji rojnameya me re axivîn.

**`Siyaseta PDK ê hevkariya wê bi Tirkiyê re dide nîşandan`**


Nûçegihan Nede Ednan diyar kir ku siyaseta PDK’ê ya revandina rojnemevanan ji siyaseta dagirkeriya Tirk ne dur e û wiha got: “Rêheval Silêman ji destpêka 2011’an ve di asta herî jor ya tekoşîn û berxwedaniyê de weke rojnemavendekî xwedî dengê heqîqet û lêgerîna Azadiyê kar dikir. Siyaseta revandina Silêman ji aliyê PDK’ê ve weke sûcekî bêexlaqî derheqê rojnemegeriyê de tê dîtin. Bê guman ev siyaset ji siyaseta faşîzma Tirkiyê yê ku derheqê Kurdan de dide meşandin ne dur e. PDK’ê bi yekbûn û piştgiriya xwe ji faşîzma Tirkiyê re diyar dike ku ew hevkarê yekemîn di qirkirina gelê Kurd û tepisandina heqêqetê de ye. Kiryarekî bi vê rengî tenê dijminê gelekî dikare bike”.

**`Zagonên navnetewî yê parastina mafê rojnemegeran tê binpêkirin`**

Neda da xuyakirin ku li gurî zagonên navnetewî yên parastina mafê rojnemegeran, revandina rojnemevanan binpêkirina zagonên navneteweyî ye û wiha got: “PDK’ê di berdewamkirina xeta xiyanetê de sûcên giran derheqê Kurdan de dike, revandina Silêman Ehmed jî dewamiya xiyaneta PDK’ê eşkere dike. Li gorî madeya 79’an ji zagona navnetewî ya parastina mafê rojnamegeran, revandina rojnemevanan binpêkirina zagonên navneteweyî ye. Divê  gelê Kurd û raya giştî li hemberî revandina rojnemevan Silêman Ehmed helwesta xwe eşkere bike.”



Nede Ednan



Misetefa Reşo

**`Bi girtina rojnemevanan nikarin heqîqetê biguherînin`**

Nûçegihan Misetefa Reşo  anî ziman ku di şopandina dengê rastiyê de li her derê rojnemevanên Kurd tên girtin û wiha got: “Armanca girtin û revandina rojnemevanên kurd  ku dengê heqîqetê temsîl dikin, qirkirina gelê kurd e. Bi taybet bi destkeftî û serkeftinên ku gelê Kurd di vê sedsalê de bidest xistiye, zêdetir çavên dijminê gelê kurd hat vekirin. Divê em kiryar û sûcên rojane yên ku derheqê gelê Kurd de tên kirin ji bîr nekin. Rojane axa Kurdistanê rastî êrîş û talankirinê tê, li hemberî van destkeftiyan dixwazin di her kuşeyê de îradeya gelan têk bibin. Çawa ku rojane axa me tê hedefgirtin, rojnemevanên Kurd jî tên hedef girtin û mînaka wê jî revandina rojnemevan Silêman Ehmed e. Her çi siyaset bê kirin jî wê dengê heqîqetê neyê veşartin.”

**`Heyanî azadiya Rêheval Silêman ev doz erka me ye`**

Mistefa Reşo di dawiya axaftina xwe de bang rêxistinên parastina mafê rojnemegeran kir û wiha got: “PDK ê di xeta îxanetê de bi îsrar e. Li hemberî kiryar û sûcên ku li dijî rojnemevanan tê kirin, wê têkoşîn û ragehandina heqîqetê berdewam be. Li ser vê bingehê em bang tavahî rêxistinên navnetewî yên parastina mafê rojnemegeran dikin ku li hember revandina Silêma Ehmed xwedî helwestbin û rê nedin ku bi vê yekê heqîqt bê veşartin. Her wiha ji bo azadiya  Rêheval Silêman Ehmed wê têkoşîna me berdewam be.”



# Kampaniya ‘Ji Rêber Abdullah Ocalan re Azadî, ji Pirsgirêka Kurd re Çareserî’ li cîhanê deng veda

Kampaniya cîhanî ya bi dirûşmeya ‘Ji Rêber Abdullah Ocalan re Azadî, ji Pirsgirêka Kurd re Çareseriya Siyasî’ ku di 10’ê Cotmehê de hatibû destpêkirin, li tevahiya cîhanê belav bû. Li Bakur û Rojhilatê Sûriyê jî tavahiya tevger û gelên herêmê ji bo piştgiriya kampaniyê  çalakiyên xwe dewam dikin. Endamên Insiyatîfa Sûriyê ya Azadiya Rêber Abdullah Ocalan dan zanîn ku ew ê bi kar û xebatên xwe, herwiha bi bilindkirina asta têkoşînê vê kampaniyê bighînin armanaca wê û azadiya Fîzîkî ya Rêber Apo misoger bikin.

Birûc Resûl/Qamişlo

Kampaniya cîhanê ya Ji bo Azadiy Rêber Abdullah Ocalan li 74 navendan li seranserî cîhanê di 10`ê Cotmehê de bi dirûşma ‘Ji Abdullah Ocalan re azadî û ji pirsgirêka kurd re çareseriya siyasî’ bi pêşengiya kesayet û saziyên li ser asta navneteweyî û cîhanê dest pê kir. Kampanî fireh bû û heta niha hejmara navendan 100 derbas kir. Her wiha gelek saziyên civakî, rêxistin, partî û gelên bakur û rojhilatê Sûriyê tevlî kampaniyê bûn û çalakiyên cûda li dar dixin.

Derbarê Kampaniya azadiya Rêber Abdullah Ocalan endamên Insiyatîfa Sûriyê ya Azadiya Rêber Abdullah Ocalan Nûha Omer û Silêman Ahmed ji rojnemeya me re axivîn.

Nûha Omer di destpêka axaftina xwe de da zanîn ku kampaniya ji bo azadiya Rêber Apo ku bi 74 navendên cîhanî hat destpêkirin, îro jî zêdetirî 100 navendên cîhanî belav bûye û wiha got: “Destpêkirina vê pêngavê, encama têkoşîna Rêber Apo ye ku 50 sal in bê navber raber dike. Rêber Apo ji bo hemû gelên cîhanê, bi taybetî ji bo jinan kedeke mezin da. 25 sal in li Îmraliyê di bin tecrîdek giran de ye. Bi taybetî ji 25’ê Adara 2021’ê ve tecrîd ewqas hat girankirin ku bi ti rengî agahî ji Rêber Abdullah Ocalan nayê girtin. Bi kampanya ku 10’ê Cotmehê hate destpêkirin re, gelên bindest, gelên azadîxwaz, rewşenbîr, hunermend, jin û tevgerên ekolojîk azadiya xwe di fikir û felsefeya Rêber Apo de dibînin. Ev hêza paradîgmaya Rêber Apo nîşan dide. Her wiha kampaniya ji 74 navedên cîhanî hat destpêkirin û niha jî em dibînin ku zêdetirî 100 navendên cîhanî çalakiyên xwe ji bo azadiya Rêber Apo ya fîzîkî bi duruşmeya ‘Ji Abdullah Ocalan re Azadî, ji Pirsgirêka Kurd re Çareserî’, didomînin.”

**‘Fikir û felsefeye Rêber Apo riya jinan ronî kir’**

Endama Insiyatîfa Sûriyê ya Azadiya Rêber Abdullah Ocalan Nûha Omer wiha axaftina xwe bi dawî kir û got: “Fikir û felsefeye Rêber Abdullah Ocalan çavkaniya hêza mirovahiyê ye, her wiha jin ji tarîtiyê derbasî ronahiyê kir, ku ew sêstema desthiledar ya li ser jinan hatibû feriz kirin, hejand. Jin bi hêz û nasnemeya xwe îdî cihê xwe di gelek qadan de girtiye û jinên bakur û rojhilatê Suriyê jî bûn mînak ji jinên cîhanê re. Li ser vê bingihê pêwîste em wekî jin xwedî li fikir û felsefeye Rêber Abdullah Ocalan derkevin û tekoşîn û berxwedaniya xwe ya ji bo azadiya Rêber Apo a fîzîkî xurtir bikin. Banga me ji bo rêxistinên mafê mirovan û rêxistinên ku bi rewşa Rêber Apo re eleqedarin ku bi erkên xwe yên exlaqî rabin, her wiha pêwîste êdî azadiye Rêber Apo a fîzîkî pêk were.”

**‘Kampanya azadiya Rêber Apo wê bighije armanca xwe’**

Di heman çarçoveyê de Silêman  Ehmed diyar kir ku bêdiveya mirovahiyê bi azadiyê û demokrasiyê ve heye û di fikir û felsefeya Rêber Apo de çareseriys pirsgirêkên hemû cûhanê ye ne tenê pirsgirêkên kurd û wiha got: “Gelê Kurd li Kurdistanê û derveyî Kurdistanê Jî, komploya ku li dijî Rêber Apo hate kirin, bi tu rengî qebûl nakin. Weke tevger û gel  ev 25 sal in em li dijî Komploya Navneteweyî têdikoşin. Kampanyaya ku 10’ê Cotmeha 2023’an hate destpêkirin, xaleke diyarker di têkoşîna gelê kurd û gelên azadîxwaz de ye. Bi destpêkirina kampanyayek bi vî rengî re hatiye îspatkirin ku têkoşîna li dijî Komploya Navneteweyî gihiştiye asta pêwîst û wê ji vir û şûnde ve bi çalakiyên bi bandor bigihije armanca xwe ku di dirûşmeya kompleyê de bi kurtî hatiye vegotin. Bi vî rengî têkoşîna li dijî Komploya Navneteweyî gihiştiye asta cîhanî. Bi vê têgihiştin û berpirsyariyê em bawer dikin ku kampanya wê bighije armanca hatiye destnîşankirin.”



Nûha Omer



Silêman Ehmed

**‘Tekez em ê bi serkevin’**

Endamê Insiyatîfa Sûriyê ya azadiya Rêber Abdullah Ocalan Silêman Ehmed wiha axaftina xwe bi dawî kir û got: “Têkoşîna li dijî Komploya Navneteweyî li qada navneteweyî tê meşandin. Ev yek ne tenê ji bo gelê kurd, ji bo têkoşîna azadî û demokrasiyê ya cîhanê jî pêşketineke gelekî mezin e. Rêber Apo ji têkoşîn û nirxên cîhanî yên mirovahiyê bawer kir û têkoşîn da destpêkirin. Hîn zêdetir giranî da ser têkoşîn û nirxên hevpar ên hemû beşên civakî yên bindest û gelan û ev yek gihandiye çarçoveyeke îdeolojîk û teorîk û bersiva herî bi wate daye Komploya Navneteweyî. Banga me ya pêşîn ji bo gelê welatparêz ê Kurdistanê û li derveyî kurdistanê jî ku li dijî Komploya Navneteweyî bê navber têkoşînê berdewam bikin. Encameke vê têkoşînê ye ku îro gelên bindest ên cîhanê, jin û ciwan li têkoşîna kurdan û ya Rêber Apo bibin xwedî, bi baweriya azadiya Kurdistanê divê mirov tevlî kampanyaya ku hatiye destpêkirin bibin. Heta ku azadiya Rêber Apo a fîzîkî pêk bînin. Bi van hest û bangan, em kampanyaya ‘Azadî ji bo Abdullah Ocalan, Çareseriya Siyasî ji bo Pirsgirêka Kurd’ pîroz dikin, herwiha em bawerin ku wê kampaniya ku me daye destpêkirin wê bi ser bikeve.”

## Nakokiya dijwar a lûtkeya Riyadê



Zekî Bedran

Yekîtiya Ereb û Islamî li Riyadê civiya. Armanca civînê bidawîkirina êriş û dorpêça Israîlê ya li ser Gazzeyê bû. Welatên Islamî û Ereb di bin zexta civakên xwe de bûn. An jî weke dewlet û hikumet tişteke li dijî Israîlê dikin an jî dê bikin tune bû. Îrana dijminê Israîlê ye û ragihand ku piştgiriya Hemasê dike jî naxwaze tevlî şer bibe. Di ser komên girêdayî xwe re mesajan dide DYE yê û diyar dike ku dê li herêmê serê DYE yê biêşîne. Îran hîn zêdetir şerê wekaletê birêxistin dike.

Erdoganê ku xwe li hemberî Israîlê dizirtikîne û Hemas weke mucahîd îlan kir jî bi mezinkirina bazirganiya bi Israîlê ve mijûl e. Li gorî daneyên hatine ragihandin bazirganiya Tirkiyê ya bi Israîlê re zêde bûye. Dewletên heyî berjewendiyên xwe di ser hertiştî re digirin, ev ne tiştek nayê zanîn e. Niha rexnekirina Israîlê û hinek hewldan ne xwedî rîskek mezin e. Êrişên Israîlê di TV yan de bi zindî têne weşandin. Ev jî raya giştî ya cîhanê bandor dike. Ji ber ku bi hezaran sivîl, zarok û jin di van êrişan de jiyana xwe ji dest didin. Heman demê de bajarek li ber çavê cîhanê tê kuştin. Ev zêdetirî mehekî ye şer didome, welatên Islam û Ereban zêde tiştek nekirin. Tiştên kirin hinek bangawazî û hinek hewldanên dîplomatîk bûn. Ji bo rihetkirina wijdana xwe hinek alîkariyên mirovî şandin. Tirkiyê hinek alîkariyên mirovî û derman şandin. Xwest bi van alîkariyan wisa bide nîşan ku gelek tişt kiriye û weke amûra propogandayê bikar anî. Danezana encama lûtkeyê jî ji derveyî tiştên me diyar kirine tiştek din nabêje. Bang li Israîlê tê kirin; dorpêçê rake û êrişan bisekinîne. Dibêjin bila ambargoya çekan li Israîlê bê kirin û hwd…

Nakokiya herî mezin ew bû ku Erdogan, nûnerên Sûriye û Iraqê li kêleka hev bûn. Lûtkeyê dagirkeriya Israîlê û êriş şermezar dikirin. Lê Erdogan beşek girîng ê axa Sûriye û Iraqê dagir kiriye. Cihê dagir kiriye têr nabîne. Dixwaze şer di nava van herdû welatên Ereb û Islamî de belav bike. Israîlê bi tunekirina nîjadî tewanbar dike. Lê heman tiştî li ser Kurdan dimeşîne. Gelê Kurd jî endamê ola Islamê ye, hemwelatiyên Sûriye û Iraqê ne. Axên ku li ser dijîn bi awayekî fermî di nava sînorên van dewletan de ne.

Mirov dipirse; ev çi nakokiyek dijwar e! Dema Filistînî bin mazlûm in, dema mijar Kurd bin ji nedîtî ve tên! Ev dikeve nava kîjan hişmendiya demokrasî û olî, dikeve nava kîjan prensîba mirovî? Ma divê dewletên dibêjin em Islam û Ereb in bersivekî nedin vê pirsê? Her kes dizane ev bi salane çi bi serê Kurdan dikin. Ne ku nizanin. Nêrîna wan a netewperestî û berjewendiyên wan zêdetire. Ji ber wê jî Kurd ji pêşketinên demokrasî û siyasî veder kirine. Çavê xwe ji qirkirin û koçberkirina wan re girtine. Dewletên weke Qeterê jî bûne hevkarên Erdoganê qirker û dewleta Tirk.

Netenyahû dibêje ku dê xeta Gazzeyê bixe bin venêrînê, ewlehiyê çêbike û Hemasê tune bike. Heman gotinên Erdoganê faşîst in! Erdogan jî li Sûriyê kûrahiya 30 km weke korîdora terorê binav dike. Dibêje ez vê herêmê weke korîdora xwe ya ewlehiyê îlan dikim. Ev kûrahiya 30 km bi gotina wan korîdora Kurdan e. Yanî herêma ku piraniya wê Kurd in. Tirkiye dixwaze Kurdan ji vir derbixe û şêniyek ji derve de bîne li vir bicih bike. Ev yek pênaseya tunekirina nîjandî derbas dike, bi awayek zelal qirkirin e. Kurd ji bo carek din venegerin ji axa xwe tên derxistin û belavkirin. Yanî êdî weke gel nikarin li wir bimînin û tune bibin.

Erdogan van tiştan tenê ji bo gefê nabêje. Ji sala 2018’an ve li herêmên dagirkirî yên weke Efrînê tişên em dibêjin pêk tîne. Li van herêmên ku Kurd lêne tunekirina nîjadî hatiye kirin. Tiştek nemaye ku bi serê Kurdan neaniye û Kurd li herêmê nehêlane. Li herêmên ku li Sûriyê dagir kirine, bi hezaran komên çete yên çekdar rêxistin kiriye û berdane ser serê gel. Sûcên şer ên kirine ketine raporên NY û saziyên din jî. Lê kesek ji bo vê neketiye tevgerê. Tirkiye bi hişmendiya ku Kurd bê xwedî ne tişta dixwaze dike.

Ji bo Filistînê kesên aştî dixwazin û li dijî zilmê ne li DYE û Ewropayê daketin kolanan. Hikumetên xwe xistin bin zextê. Ji ber sedemê van zextan DYE jî di nav de gelek rêveberî neçar man helwestên xwe di ber çavan re derbas bikin û neçar man hinek gavan biavêjin. Careke din hat dîtin ku daxwaza gelan a ji bo aştiyê û piştgiriya bi bindestan re dibe sedema encamên ku hikumetan derbas dike. Gelê Kurd jî wê bi berxwedan û birêxistinbûna xwe tecrîd û dîwarê bêdengiyê derbas bikin. Divê xwe bigihîne gel û sûcên faşîzma Tirk eşkere bike.

## Nameyên Seyîd Riza



Farûk Sakik

Di sala 1937’an de li dijî Dêrsimê Kemalîstan komkujiyek dabûn destpêkirin. Kurdan di pêşengtiya Seyîd Riza de berxwedaneke mezin didan.

Di 5’ê Îlonê de Seyîd Riza û 74 hevalên xwe bi bêbextî dîl hatin girtin. Di 15’ê Mijdara 1937’an de Seyîd Riza li Elezîzê hat bidarvekirin.

Li ser kesayeta Seyîd Riza û Dersimê gelek tişt hatin gotin.

Ev rastiyeke nayê înkarkirin ku Seyîd Riza ji bo Kurdên Elewî lîderekî olî û serokeşîrekî xwedî nirxeke sosyolojîk e.

Her wisa, dema ku mirov lêkolînek baş bike wê were famkirin ku Seyîd Riza di siyaseta Kurdan de aktorekî wê serdemê ye.

Me Seyîd Riza bi nameya ku ji rayedarên Fransî re şandî baş nas kir. Sal derbas bûn dîroknas û akademîsyen Dr. Sedat Ulugana ev name ji arşîvan derxist.

Name li Dersimê tê nivîsandin, ji konsolosxaneya Fransa ya Stenbolê re tê şandin û ji wê jî derbasî Fransayê tê kirin.

Ev name ji bo piştgirî bide Şerîf Paşayê ku di Konferansa Aştiyê de Kurdan temsîl dike.

Di nameya ku hat bidestxistin de tiştek herî balkêş jî Seyîd Riza di sala 1920’î de rejîma Kemalîst nas kiriye. Kiryarên rejîma Kemalîst yên piştî Lozanê, wî wê demê, di nameya xwe ya 3 sal berê de nivîsandiye.

Di nameya ku di sala 1920’î de ji Sevrê re şandiye, Seyîd Riza û serokên eşîran li ser navê “neteweya Kurd a 8 milyon kesî” daxwaza “mafê çarenûsa Kurdan” kirine.

Taybetmendiyeke din a girîng a nameyê jî ev e: Kurd aîdiyeta Kemalîstan qebûl nakin. Ew jî dibîne ku “Kemalîstên ku ji bermayiyên Komîteya Îttîhad û Terakkî pêk tên” bi şêweyekî Tirkperest û Turanîst hewl didin netew-dewletekê ava bikin.

Hemû pêşdîtinên wî rast derketin. Piştî peymana Lozanê komkujiyan dest pê kir. Tu mafek Kurdan nas nekirin. Sozên dabûn yek bi yek ji bîr kirin.

Piştî gelek serhildanan. Di Gulana 1937’an de artêşa Kemalîstan berê xwe dabû Dersimê. Dema komkujiyan dest pê kir, Seyîd Riza di 30’ê Tîrmeha 1937’an de ji bo Wezareta Karê Derve ya Brîtanyayê re nameyek şand û digot:

Wezîrê hêja, ji salan vir ve hikûmeta Tirk hewl dide ku Kurdan asîmîle bike. Weşanên bi zimanê Kurdî qedexe dike. Li kesên ku bi zimamê xwe diaxife zilmê dike û weşan û rojnameyên Kurdî qedexe dike. Kurdan ji xaka bixêrûbêr ya Kurdistanê ber bir Anatolyaya ziwa ve sirgûn dike. Di rêyan de gelek însanên me telef dike û li ser wan zilmeke nedîtî dimeşîne.

Seyîd Riza van kiryarên dewleta Tirk 3 sal berê dîtibû û di nameya xwe ya ji Sevrê re jî şandibû. Dek û dolabên Kemalîstan pêşî li van hewldanên wî bûbûn asteng.

Ev kiryarên ku di nameya ji bo Wezareta Karê Derve ya Brîtanyayê hatî şandin hetanî PKK derket qada têkoşîna azadiyê dewam kir.

Ew lîstik û siyaseta li hemberî Seyîd Riza pêk anîbûn dixwestin di şexsê Rêber Apo de jî bi ceribînin. Lê bi ser neketin.

Rastiyeke, Seyîd Riza pêşeng û rêberê Kurdan bû. Li gorî şertên demê hewldanên wî bi ser neketin.

Wê demê li hemberî hîle û derewên wan Seyîd Riza nikaribû bi ser bikeve, ev ji wî re bûbûn derd, lê belê wî jî serê xwe li ber wan netewand, ev jî, ji dijmin re bû derd.

Di hemû serhildanan de rola Rêbertiyê gelek girîng bû. Bi serhildanê de bi tunekirina rêbertiyê dawî li serhildanan dihat. Lê di serhildana PKK’ê de ev yek wiha nebû. Dema Rêber Apo dîl hat girtin herkesî got temam ev tevger bi dawî bû. Lê Rêber Apo dîroka Kurdan baş analîz kiribû. Destûr neda ku dîrok xwe dubare bike.